



Birêz milletên Bochum,

Vaksînlêdana Koronayê mijarek e ku niha bandorê li gelek welatiyan dike.

Vaksîn lêdan çi feyde heye?

Ez çawa dikarim randevûyekê çê bikim?

Divê ez jibo vaksînlêdanê çi bi xwe re bînim?

Ev tenê çend pirs in, ku gelek welatiyan aciz dikin. Di vê belavokê de em ji we re tiştên herî girîng ên derzîlêdana an vaksînlêdanê li Bochumê bi kurtî dibêjin.

Ji kerema xwe bi nixumandina rûdankê, paristina qaîdeyên paqijiyê, li hevdu dûr mandin, û guherîna hewayê, hay ji xwe û kesên din jî hebe.

Û: **Vaksîn li xwe bidin!**

Britta Anger ya we Serokê Tenduristiyê

Çima hûn divê vaksîn li xwe bidin!!

Korona nexweşiyek giran e, gelek caran bi pêvajoyên tûj û giran ve dibe sedema mirinê jî. Bi taybetî, komên mîna pîr û kalan an nexweşên kronîk di bin metirsiya mezin a pêşveçûna nexweşiyek giran de ne.

Di heman demê de, pandemîk jiyana me ya civakî, aborî û çandî jî bi dijwarî teng dike. Vaksînlêdan îlaceka bi bandor, ceribandî û îspatkirî ye ku li dijî nexweşiyên re şer dike. Ji ber vê yekê, li dijî Korona vaksîn li xwe bidin, da ku

- xwe li nexweşiyek bi pêvajoyek tûj û giran biparêzin,
- metirsiya korona di malbat, heval û cîranên xwe de kêm bikin û
- arîkariya sinordarkirina pandemiyê bikin.

Li vir, ku em hîn jî hene!

Tixûbên têkiliyê tenê tene sivik kirin heke hemî welatiyên Bochum bi hev re tevbigerin û vaksîn li xwe bidin. Ji ber ku em dîsa bikaribin bi malbatên xwe, hevalên xwe û civakên xweyên olî cejinên xwe pîroz bikin, gelo ew cejinên Sersal, Hanukkah an mîhrîcana şekirê be. Ka em bikin, çimkî ew bi ya me ye!

Dermanê Kutanê

Dermanê kutanê çiqas ewleh ne?

Dermanê kutanê wekî her dermanek din ewledar in. Berî pejirandinê, ew li gorî pîvanên qanûnî bi baldarî hatine ceribandin û kontrol kirin. Digel pejirandina kurtir jî, heman standardek jibo dermanan derbas dibin, ku erêkirina wan dirêjtir in. Gava ku ew jibo destûra bazirganiyê hatine pejirandin, ew ê bêne kontrol kirin. Bandorek, jibo nimûne, ji sedî 60an, ku di nihêrîna yekem de kêm xuya dike, ji hêla bijîşkî ve nixek girîng heye û gelek mirovan, dermanê kutanê ku bi salan bi serfirazî hatine bikar anîn, nagihin wan. Di her rewşê de, ew bes e ku pêşî li pêşveçûna nexweşiya giran bigire.

Bandorên rexekiyên vaksînlêdanê çi ne?

Wekî her vaksînen din, belkî bandorên rexekî hebin. Bertekên vaksînlêdanê çêdibin û çend rojan dom dikin. Agahdariyên nû li ser bandor û ewlehiya vaksînlêdanê dikare li Pirs û Bersiv ya Enstîtuya Robert Koch li serhêl li ser vê lînkê temaşe bikin www.rki.de/SharedDocs/FAQ/COVID-Impfen/gesamt



Piştî vaksînlêdanê, ma hîn jî mimkin e ku ez bi vîrûsa Koronayê bikevim an bêyî ku nexweş bibim vîrusê xwedan bikim?

Cude ji çêkera vaksînê, vaksînlêdan li dijî enfeksiyonek giran mîna korona parastina baş dike. Wekî din, metirsiya veguhêztina koronayê ji kesên din de kêm dibe.

Ma di vaksînan de materyalê ajalan jî heye?

Na, vaksînen ku niha hatine pejirandin, materyalê heywanan tune.

Piştî vaksînlêdanê ez hîn jî dikarim ducanî bibim?

Vaksînlêdan li dijî koronayê li ser ducaniyên pêşerojê de tu bandor tune.

Dermanê Kutanê

Kengê ez dikarim vaksîn lêdem?

Kampayna vaksînlêdanê koronayê bi berdewamî pêşve diçe. Her ku diçe mirovên zêdetir ji komên pişeyîyan mafê vaksînlêdanê distînin. Hûn dikarin ji kompaktek bibînin ku kî dikare berê kengî û ji hêla kê ve were vaksîn kirin.

Hûn dikarin wan li li ser vê lînkê bibînin www.bundesregierung.de/breg-de/themen/coronainformationen-imichtung/coronaimpfverordnung-1829940

Ji kerema xwe bêyî randevû neçin navenda vaksînlêdanê.

Divê ez jibo vaksînlêdanê çi bi xwe re bînim?

Ji kerema xwe karta nasnameya xwe, karta bîmeya tenduristiyê xwe, pejirandina randevûya xwe ku tê de kodê veguhastinê hatiye (çapkirî an di forma dijîtal de) û belgeya vaksînlêdana xwe bi xwe re bînin. Heke hûn belgeya vaksînlêdanê tune be, hûn ê sertîfîkaya vaksînlêdanê bistînin.

Navnîşana navenda vaksînlêdana Bochum çi ye?

Navenda Vaksînlêdana Bochum
RuhrCongress Bochum
Stadionring 20
44791 Bochum



Ez ê çawa bi otomobilê biçim navenda vaksînlêdana Bochumê?

Ji A40-ê tê, ji Stadion-ê derkeve, rasterast berê xwe bide ser Stadionring-ê. Piştî nêzîkê 400 metroyî hûn ê dorpêçek derbas bikin û derketina sêyemîn bigirin. Piştî teqrîben 50 metîrî, têketina parka otomobîlan a bin erdê li milê weyê çepê ye. Li vir hejmarek sînordar a cîhên belaş ên parkîrinê hene.

Ez ê çawa bi otobus û trêne biçim navenda vaksînlêdana Bochumê?

Otobusa hejmarê 354, Rewestgeha „Ruhr-Congress“
Rêzikên tramwayê 308, 316 an 318, Rewestgeha „Vonovia Ruhrstadion“ (mesafeya bi pê çûnê: teqrîben 5 hûrdem).

Ma gihîştina navenda vaksînlêdanê bê asteng e?

Navenda vaksînlêdanê li RuhrCongress Bochumê bê asteng e. Li wir çerxekursî jî hene.

Ma lêçûnên taksîyê têne dayîn?

Na, niha lêçûnên veguhastinê nayên dayîn.

Ma ez dikarim kes bi xwe re bibim vaksînlê- danê?

Hûn dikarin kesek bi xwe re bibin da ku di vaksînlêdanê de ji we re bibe alîkar. Lêbelê, ev tenê tê vaksînlêdanê, heke wê randevûyek dê xwe re hebe.

Kijan rêzikên paqîjîyê li navenda vaksînlêdanê têne bikar anîn??

Qanûnên paqîjîya giştî di navenda vaksînlêdanê de derbas dibin: Li hevdu dûr bimînin an dûr bisekinin, Li rêzikên kuxukê û pijmînê mêze bikin û rûdankê li xwe bikin.

Baldarî:
ji kerema xwe, bala xwe bidinê ku Mirovên bi nîşanên sermayê an tayê nikarin biçin navenda vaksînlêdanê.



Vaksînlêdanê çawa dixebite?

Piştî qeydkirina li navenda vaksînlêdanê, hûn ê belgeyek biçûk û formek razîbûnê ku hûn divê tijî bikin, distînin. Vebijarka we jî heye ku hûn bi bijîşkek re bişêwirin. Vaksînlêdan bixwe ji hêla personelên bijîşkî ya pispor li babeteka taybet de tê pêşkêşkirin. Dûv re, ji we re tê pêşniyarkirin ku jibo 5 heya 10 hûrdeman li wir bimînin jibo çavdêriya şopandinê; nexweşên ku di bin xeterê de ne, divê 30 hûrdeman bimînin.

Belge û forma razîbûnê ji vir têne daxistin:
www.bochum.de/impfzentrum/download


Ez li ku derê dikarim agahdariya bêtir li ser vaksînlêdanê bistînim?

- **Navenda vaksînlêdana Bochum**
www.bochum.de/impfzentrum
- **Robert Koch-Institut**
www.rki.de
- **Komeleya Federal a Bîmeyaya Tenduristiyê ya Qanûnî (Kassenärztliche Bundesvereinigung)**
www.116117.de/de/corona-impfung.php



Impfzentrum Bochum
im RuhrCongress Bochum
Stadionring 20
44791 Bochum
www.bochum.de/impfzentrum

Bi hevkarîya civakên Xiristîyan û Misilman ên li Bochum.



Bochum vaksînan lêdixe!

Tiştên herî girîng li awirek de